Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :753 18-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Di nava çand û wêjeya Kurdî de cihê piştgiriiyê

**Çanda piştgiriyê li Kurdistanê her tim hebû. Jiyana li nava gundan bi piştgiriya li hev dibihurî. Ev rê û rêbaza jiyanê bi wêjeya devkî ya Kurdî dihat xemilandin.**

Kurd di vê dema têkoşîna li dijî korona de ji bo piştgiriya hev bikin, kampanya û organîzasyonan li dar dixin. Ya rast, çanda piştgiriyê li Kurdistanê her tim girîng bû. Bi wêjeya devkî jî ji nifşên paşrojê re hat ragihandin.

Ji dawiya sedsala 19'an heta destpêka sedsala 20'an gelek komeleyên Kurdan çêbûn ku mêvandarî ji gelek rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd re kirin. Di çand û rewşenbîriya Kurdî de rola van komeleyan girîng bû. Hin ji wan tevî têkoşîna ji bo mafên Kurdan her wiha ji bo alîkarî û piştevaniyê dixebitîn. Komela Vîna Zexm a Kurdistanê, Komela Hevkarî û Pêşketina Kurd, Komela Xwendekarên Kurd Hevî, Komeleya Hevkariya Kurdistanê, Komeleya Rênîşandan û Bilinkirina Kurdan û Komeleya Hevkariya Kurdistanê çend ji wan bûn.

Piştî ku Komara Tirkiyê tevgerên siyasî, çandî û civakî yên Kurdan qedexe kirin, pêşeng, rewşenbîr û rûspiyên Kurdan ên wê demê berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê. Tevgerên civakî û siyasî ku piştre di kategoriya rewşenbîriya Kurd a modern de dikarîbûn bihatina dîtin, ji aliyê Kurdan ve li vê herêma ji aliyê Kurdan ve weke Binxetê tê pênasekirin, dest pê kir. Ji wir gihîşt Heleb û Şamê, ji wir jî xwe gihand Beyrûd û Qahîreyê.

Xoybûn li paytexta Lubnan Beyrûdê bi pêşengiya Nûrî Dersimî, Ekrem Cemîlpaşa, Memdûh Selîm Celadet Alî Bedirxan û Kamûran Alî Bedirxan ve sala 1927'an ava bû û bû yek ji tevgerên civakî û siyasî yên herî girîng ku navê xwe li dîroka nêz a Kurdistanê nivîsî. Ne tenê wê demê, piştre jî Kurdên ji zilma dewleta Tirk reviyan xwe li Binxetê girtin û ji wir jî piştgiriya serhildanên biçûk-mezin ên li bakurê Kurdistanê kirin.

### MÎNAKA PIŞTEVANIYÊ YA JI SALA 1932'AN Û VIR VE

Kovara Hawar sala 1932'an ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve li Şamê hate derxistin. Ji hejmara 2'emîn a kovarê em hîn dibin ku li herêma Cizîrê ya Rojavayê Kurdistanê "Civata arîkariyê ji bona belengazên Kurd li Cizîrê" ava bûye. Kesayetên Kurd ên wê demê Cegerxwîn, Dr. Ehmed Nafis, Ebdilrehmanê Eliyê Yûnis, Hemze Begê Muksî, Osman Sebrî, Resûl Axa, Hesenê Haco Axa û Eliyê Topiz pêşengî ji vê komeleyê re kirin û ji bo pêwîstiyên tenduristiyê û xwarinê ji Kurdên wê demê hewcedar bûn, hatiye avakirin. Komele bi biryara Xoybûnê ava bûbû. Pereyê ku ji Kurdên dewlemend dihate komkirin dişandin navenda li bajarê Hesekê, ji wir jî li herêma Cizîrê li mirovên hewcedar dihate belavkirin. Di hejmara 1'ê Hezîrana 1932'an a kovara Hawarê de ev banga komeleyê hatibû weşandin: "Ey Kurdno! Em ewladên miletekî ne ku herî zêde divê em piştgiriya hev bikin. Cahîltiya me ji feqîriya me jî tê. Deynê mirovên hezkiriyên vî miletî ye ku destê xwe dirêjî hev bikin."



Piştî 'Tengaviya 1929'an' ku li gelemperiya cîhanê bû sedema birçîbûn, xelayê ya herî giran a sedsala dawî, vê komeleya piştevaniyê ya ku li parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê ava bû, nayê zanîn ku xwarin biriye çend malên Kurdên xizan.

KOMELEYA SALA 1956'AN

Rewşen Bedirxan, Hesen Hişyar, Heyder Heyder û Osman Efendî sala 1956'an li mala Dr. Nûrî Dersimî ya li Helebê li hev kom bûn û bi navê Komela Zanistî û Alîkariya Kurd komeleyek ava kirin. Ji ber ku rêxistinbûna Kurdên li Sûriyeyê bi temamî hate qedexekirin, temenê wê tenê du sal bû. Komeleyê dixwest piştevaniya nava Kurdan xurt bike û têkoşîna maf û azadiyê ya Kurdan bi belavokên Erebî, Yewnanî û Fransî bide naskirin.

### PIŞTEVANIYA DI NAVA WÊJEYA DEVKÎ DE

Di nava dîroka sed salî ya Kurdistanê de bêguman gelek mînakên piştevaniya rêxistinî hene. Eger em jiyana li bajarên nûjen deynin holê, dikarin bêjin ku çanda piştevaniyê li Kurdistanê heta roja îro gelekî girîng hatiye dîtin. Jiyana li gundan bi çanda piştevaniyê bihurandine. Ev rêbaza jiyanê bi wêjeya devkî ya Kurdan hatiye xemilandin û xurtkirin. Karên ku bi hevkarî dihatin kirin hem helbest, stran û çîrok xwedî dikirin, hem jî moral û tempo dida vê wêjeya devkî.

### ZIBARE, ZÊW Û ŞEVBÊRK

"Zibare" li jiyana gundên li Kurdistanê sîstemeke piştevaniyê ye ku nebe nabe. Biharê, havîn û payîzê mirovan bi hev re li zevî, bax û baxçeyên hev bêyî ku berdêla wê bixwaze bi hev re dixebitîn û navê wê jî "Zibare" ye. Ev çand hîn jî li Kurdistanê didome. Di nava vî karî de ya herî girîng jî "Paleyî" ye ku gundî di dema çinîna genim, nîsk, nok û hwd. de li hev kom dibinû bi hev re vî karî dikin.

Li bax û baxçeyan jî "Merdan" bi hev re tê kirin. Li herêmên Botan û Xerzanê yên Kurdistanê ji karê çêkirina xaniyan re "Axaban" tê gotin ku ev kar bi hevkarî tê kirin.

"Zêr" jî xwarina payîzê ya ji bo zarokan e. Zarok ji malê kevçiyan radihêjin û her sal bi dorê li malekê vê xwarinê dixwin.

Li gundên Kurdistanê "Şevbêrk" nebe nabe. Bi taybetî salên ku televîzyon û telefon nebûn, gundî her êvarê li gundekî li hev komdibûn, qala çîrok û bûyeran dikirin.

## Werşeya Lavîn rojane 500 kincên bijîşkî didirû



Wek însiyatîfên civakî ku welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tînin, werşeya Lavîn rojane ji bijîşk û xebatkarên tenduristiyê re 500 cil û bergan bê heq didirû.


Ji ber qedexeya li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya li dijî berbelavbûna Koronavîrusê, çalakiyên civakî li herêmê bi pêşkêşkirina însiyatîfên mirovî yên bi hedefa piştevaniya tevahî çînên civakê, berdewam in.

Girêdayî mijarê werşeya Lavîn a li bajarê Hesekê dest bi însiyatîfa dirûtina çakêtên bijîşkî ji bijîşk û hemşîreyan re kir.

Karkera li werşeya Lavîn a bi navê Heyfa Hemo diyar kir ku wan ji dema berbelavbûna Koronavîrusê li cîhanê dest bi vê însiyatîfê kiriye û wiha got: "Hedef ji vê însiyatîfê alîkariya bijîşk û nexweşxaneyan e. Ev însiyatîf bê pere ye, rojane 500 çakêtên bijîşkî didirûn."

Heyfa da zanîn ku der barê dabînkirina caw de astengiyan dikişînin û wiha domand: "Bi hêvî me ji me re di zûtirîn demê de caw bê peydakirin da ku em nesekinin."

Heyfa Hemo bang li rêxistinên navneteweyî û mirovî kir ku derbasî tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin û alîkariya şêniyan bikin.



## Bi wêne... rengîniya bihara Şehbayê

Kantona Şehbayê bi hêşînayiya biharê hatiye xemilandin.

Piştî serma û seqema demsala zivistanê li ser şêniyên kantona Şehbayê û koçberên ji Efrînê, bihar hat û bi xwe re kêfxweşî û hêvî ji herêmê re anîn.

Di van rojan eraziyan cil û bergên xwe yên herî xweşik li xwe kirine, rengê gul û çîçekan li seranserê kantona Şehbayê xuya dike.

## "Hikumeta Iraqê û Başûrê Kurdistanê berpirsên êrîşa Tirkiyê ne"



Hevseroka PYD'ê Eyşe Hiso li ser êrîşa dewleta Tirk a dagîrker ya ser wargeha Mexmûr (Şehîd Rustem Cûdî) wiha got: "Helwesta hikumeta Iraqê ya li dijî êrîşa Tirkiyê ya ser wargehê têrê nake. Hikumeta Iraqê û Başûr Kurdistanê berpirsên êrîşa Tirkiyê ne."*R-4*

## KNK'ê banga diyalogê li YNK û PDK'ê kir

KNK'ê bi daxuyaniyekê bang li PDK û YNK'ê kir ku hêzên xwe yên ne pêwîst ji Zînê Wertê vekişînin û pirsgirêkê bi riya diyalogê çareser bikin. *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 753 18-Nîsan- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Desteya Perwerdeyê li ser Rojava TV dest bi perwerdeyê kir



Di çarçoveya xweparastina ji Koronavîrusê de, Desteya Perwerdeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja Pêncşemê bi riya Rojava TV dest bi perwerdeyê kir. *R-2*

# "Berpirsyariya rêveberiya Başûr"

Partiyên Kurd yên Rojava bi daxuyaniyekê bang li rêveberiya Herêma Kurdistanê kirin ku bilez dest bi diyalogên nava Kurdan bike. Herwiha xwestin bi giyanê berpirsyariya dîrokî kar bike da planên qirêj yên pergalên dijberî gelê Kurd têk bibin. *R-2*




## Dewleta Tirk hêza xwe ya leşkerî li Başûrê Kurdistanê zêde kir



» Dewleta Tirk a dagîrker, hêza xwe ya leşkerî ya li baregehên xwe yên li Başûrê Kurdistanê rojên dawî zêdetir kir. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên xwecihî hatîn girtin, rejîma Tirk hêzeke nû ya leşkerî li baregehên xwe yên li Başûrê Kurdistanê zêde kiriye. *R-2*

## Li Serêkaniyê wesaiteke bombebarkirî teqiya



» Li gundekî Serê Kaniyê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagîrkirin, wesaiteke bombebarkirî ya çeteyan di dema amadekirinê de bi çeteyan de teqiya. *R-2*

## Jinên di êrîşê de jiyana xwe ji dest dayîn hatin veşartin

Di encama êrîşa li hemberî Mexmûrê de 3 jinaan jiyana xwe ji dest da û ji bo 3 jinan merasîmek hat lidarxistin. Di merasîmê de Endama Koordînasyona Meclîsa Îştar Nuran Sezgîn axivî û got: "Tevahî mirovahî li hemberê vîrûsê di nava têkoşînê de ye, lê dewleta Tirk û hevkarên wê jî hewl didin ku Kurdan îmha bikin." *R-3*



## Li Qamişlo pakêtên xwerek hatin belavkirin



Rêveberiya Xweser beşa yekê ya pakêtên xwerek li malbatên hewcedar ên ku debara xwe bi karê rojane dikin, belav kirin. *R-5*

## Kongreya Star a Efrînê êrîşa ser Wargeha Mexmûrê şermezar kir



» Rêxistina Kongreya Star a Herêma Efrînê êrîşa dewleta Tirk ya ser wargeha Mexmûrê bi daxuyaniyekê li wargeha Berxwedan a Şehabyê şermezar kir. *R-3*

# Partiyên Kurd ên Rojava: Divê rêveberiya başûr bi berpirsyariya dîrokî kar bike

Partiyên Kurd ên Rojava bi daxuyaniyekê bang li rêveberiya Herêma Kurdistanê kirin ku bi lez dest bi diyalogên nava Kurdan bike. Herwiha xwestin bi giyanê berpirsyariya dîrokî kar bike da planên qirêj yên pergalên dijberî gelê Kurd têk bibin.

Roja Pêncşemê partiyên Kurd ên Rojava daxuyaniyeke hevpar dan. Di daxuyaniyê de nameyek ji rêveberiya herêma Kurdistanê re şandin. Tê de bang li hikumetê kirin ku hewl bide nakokiya di navbera PDK û YNKê de li herêma Zînî Wertê derketî bi dawî bike.
Partiyan di daxuyaniya xwe de diyar kir ku bi saya fedekariya gelê Kurd yê li başûrê Kurdistanê û partiyên Kurdistanî piştî ku nakokiyên xwe dan aliyekî, gelê Kurd bi riya destûrê mafê xwe bi dest xist. Lê di vê dawiyê de li herêma Wertê asta nakokiya di navbera PDK û YNK`ê de zêde bû. Ev nakokî wê ne li başûrê Kurdistanê bandorê bike, li Rojavayê Kurdistanê jî wê bandorê bike. Yên sûdê ji vê nakoriyê bigirin Îran û Tirkiye ne. Êrîşên Tirkiyê yê li ser herêma Mexmûr, Xakurk û Balekaytî di vê çarçoveyê de ne. Ji ber û êrîş ji hêla partiyên Kurdistanî ve hatin şermezarkirin.
Partiyan bang li rêveberiya herêma Kurdistanê kir ku bilez hewl bide asta nakokiyê kêm bike û dest bi dîtina çareseriyan bi riya diyaloga bike. Herwiha divê çapemeniya Kurd jî dev ji hemleyên neyînî berde û aramiyê di nava gel de biweşînin.
Partiyên ku daxuyanî dayîn ev in:
-Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD)
-Partiya Lîberal a Kurdistanê
-Partiya Komînist a Kurdistanê
-Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê
-Partiya Demokart a Kurd-Sûriya
-Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê
-Partiya Çepgir a Kurd li Sûriyê
-Partiya Çepgir a Demokrat a Kurd li Sûriyê
-Partiya Kombûna Niştimanî ya Kurdistanê.
-Partiya Guhertin a Demokrat a Kurdistanê
-Partiya Nûjen a Kurdistanê
-Partiya Kedkarên Kurdistanê
-Partiya Kesk a Kurdistanê




-Partiya Rêkeftina Demokrat a Kurd li Sûriyê
-Partiya Yekitiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekitî)
-Tevgera Îslah – Sûriya
-Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Partî)
-Partiya Biratî ya Kurdistanê
-Partiya Roj a Demokrat a Kurd li Sûriyê
-Yekitiya Niştimanî ya Azad-Rojava
-Şepêla Pêşeroja Kurdistanê
-Tevgera Civaka Demokratîk
-Kongreya Star
-Partiya Têkoşîna Demokratîk
-Partiya Komarger a Kurdistanê.

## Dewleta Tirk hêza xwe ya leşkerî li Başûrê Kurdistanê zêde kir

Dewleta Tirk a dagîrker, hêza xwe ya leşkerî ya li baregehên xwe yên li Başûrê Kurdistanê rojên dawî zêdetir kir.
Li gorî agahiyên ji çavkaniyên xwecihî hatîn girtin, rejîma Tirk hêzeke nû ya leşkerî li baregehên xwe yên li Başûrê Kurdistanê zêde kiriye.
Heman çavkaniyan diyar kir, jimara leşkerên li baregeh, kozik û çeperên li herêmê hatine zêdekirin.
Dewleta Tirk a dagîrker 15'ê Nîsanê êrîşa hewayî bir ser qada Zînî Wertê û kampa penaberan a Mexmûrê. Li Mexmûrê 3 jin şehîd bûn.
Li gel liv û tevgera leşkerî ya dewleta Tirk, balkêş e ku PDK jî hêzên xwe yên pêşmergeyan li Zînî Wertê bi cih dike.
Gundê Zînî Wertê yê li herêma Qendîlê yek ji qadên di bin kontrola YNK'ê de ye.

**BAREGEH ZÊDE DIBIN, DAGIRKERÎ BERBELAV DIBE**

Dewleta Tirk bi taybetî salên dawî giranî da polîtîkayên dagîrkeriyê yên li Başûrê Kurdistanê. Dagîrkeriya Tirk hem ji aliyê leşkerî hem jî ji aliyê siyasî û aborî ve ji her demê pirtir eşkere bû.
Ji salên 1990'î û vir ve li herêmê baregehên leşkerî yên Tirk hene. Di dema rejîma AKP'ê de hem hejmara baregehan zêde bû hem jî li qadeke berfirehtir belav bû.
Baregeha destpêkê di sala 1994'an de li Selahaddînê ava kirin ku bi 25 kîlometreyan dûrî Hewlêrê ye. Ji hingî ve herî kêm 15 baregehên leşkerî yên Tirk hatin avakirin. Tevî vê yekê Rêxistina Îstîxbarata Tirk (MÎT) ji her demê bêhtir li herêmê çalak bû û gelek binesaziyên xwe ava kir.
Ji sala 2018'an ve qadên nû dagir dike. Li herêma Bradostê zêdeyî 20 nuqteyên nû ji aliyê Tirkan ve hatine dagirkirin.



## Desteya Perwerdeyê li ser Rojava TV dest bi perwerdeyê kir




Di çarçoveya xweparastina ji Koronavîrusê de, Desteya Perwerdeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê roja Pêncşemê bi riya Rojava TV dest bi perwerdeyê kir. Bi slogana "Dibistana we mala we ye, bi hev re da ku xwe ji Koronavîrusê biparêzin" Desteya Perwerdê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê sibê li ser Rojava TV dê di saet 8:00`an de dest bi perwerdeyê bike, her wiha dê bi rêya malpera Youtubeyê jî waneyan belav bike.
Hevseroka Desteya Perwerdeyê ya herêma Cizîrê Rohat Xelîl diyar kir ku ji ber xwendekar ji xwendina xwe dûr ketin, diviyabû çareseriyan bibînin û proseya xwendinê berdewam bikin li ser vî esasî wane amade kirin û paşê ew tomar kirin, bi vî awayî xwendekar dê li malên xwede bi zimanê erebî û kurdî bixwînin.
Dema dersên bi rêya Rojava TV wiha ye:
Ji saet 8:00'an heta 12:00'an
Ji saet 14:00'an heta 15:00'an
Ji saet 16:00'an heta 17:00'an
Rêveberê kanala Rojava TV Îsam Îsa piştrast kir ku ew amade ne waneyan bi rêya kanalê biweşînin.

## Li Serêkaniyê wesaiteke bombebarkirî teqiya

**Li gundekî Serê Kaniyê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagîrkirin, wesaiteke bombebarkirî ya çeteyan di dema amadekirinê de bi çeteyan de teqiya.**

Li gorî agahiyan li gundê Îhrasê yê bajarokê Menacirê yê Serê Kaniyê, çeteyên rejîma Enqereyê dema ku wesayiteke bombebarkirî amade dikir, bi wan de teqiya.
Tê gotin ku ji ber teqînê gelek çete mirine û birîndar bûne.
Têkildarî teqînê agahiyên berfireh nehatin bidestxistin.





# 'Mala min dîrok e û dîroka min jî parastina çanda jina kurd e'

Jina bi navê Hizniya Osman an jî 'Keça Kurd', mala xwe kiriye pêşengeha hewandina tiştên çanda dîrokî û foklora kurdî. Hizniya derbarê heskirina xwe ji çandê re wiha dibêjê: "Hê min ji jiyanê re negotiye ez westiyame. Tevgera min watedariyê dide jiyana min. Ji bo wê keda min bi qîmet e. Eger mirovek dîrokê biparêze wê çand zindî bimîne. Xewna min a zarokatiyê bû ku her ez di nava dîroka jina kurd e xwe his bikim."

Di dîrokê de her jinê ji bo parastina çanda xwe têkoşîn kiriye û gelek berhem ji helandinê parastine. Di dema me ya niha de jî kêm caran mirov jinên ku tiştên çandî li gel xwe hiştine dibîne, lê vê carê çîrok cuda ye. Di maleke jinekê de mirov pêşengeheke çandî dibîne. Jina bi navê Hizniya Osman ji gundê Maşoqê yê navçeya Tirbespiyê ye û bi temenê xwe 50 salî ye. Dema ku mirov derbasî mala wê dibe, hê ji deriyê malê ve mirov dizane ku ev mal jinek tê de dijî. Li ser her bostek ji axa mala xwe kulîlk çandine. Di nava wan kulîlkan de jî peykerên jinên kedkar hene. Mirov nizane ji xwe re li kû derê mêze bike. Hizniya mala xwe kiriye mîna bihiştê û bi darên mala wê ve tişteke çandî mîna selik, cerik û teşî daleqandî ne.



### HİZNİYA Jİ GİRÊDANA XWE YA Bİ ÇAND Û XWEZAYÊ RE Dİ NAVA JİYANEKE DÎROKÎ Û KEVNEŞOPİYÊ DE DİJÎ

Di mala Hizniya de gelek tiştên xweşik, bi qîmet û pîroz hene. Ji her cureyê jiyanê, keda jinê, dilnizmiya wê, tevgera wê, heskirin û girêdana bi çanda resen ve beşek girtiye û tevlî mala xwe kiriye. Jixwe Hizniya navê xwe kiriye 'Keça Kurd'. Hezkirina ji çanda kurdî û watedariya wê di dilê wê de her heye. Ev nav layiqî xwe dît û li xwe kir. Di hewşa Hizniya de her tiştên ku îro di civakê de winda ye, paşguh bûye û dibe nifşê niha nasneke jî heye. Hizniya ji girêdana xwe bi xweza û çandê re jiyaneke nû di mala xwe de afirandiye û wisa ew bi serê xwe di dîrok û kevneşopiyê de, dijî. Li ber deriyê odeya wê jî pisîkeke biçûk heye. Navê wê jî kiriye Bozo. Hizniya wê xwedî dike û dibêjê ev lawir sebra min a di malê de ye. Ya herî balkêş jî odeyek biçûk di mala wê de heye, li deriyê wê mirov mêze dike, wê kêliyekê ji xwe re di nava dîrok û çanda kurdî de bigere. Hizniya di mala xwe de pêşengeheke foklorî çêkiriye û mirov ji her deverê tên ji xwe re lê temaşe dikin.

### 'Jİ HEZKİRİNA DAYİKA MİN Jİ ÇANDA KURDÎ RE, DİLÊ MİN HÎNÎ EŞQA ÇANDÊ BÛ'

Hizniya di destpêka axaftina xwe de li ser jiyana xwe axivî û wiha got: "Li gundê Maşoqê ez hatime dinê û di nava xweşikbûna wê de ez mezin bûme. Dema ku zarok bûm, ez fêrî hemû kar û keda jinan a di jiyanê de bûm, gelek caran ez bi jinên mezin re dixebitîm û her kêliyek ji min re fêrbûneke nû bû. Jixwe dayika min dibistana min a yekem bû, ji hezkirina wê ya ji çandê re, dilê min hînî eşqa çanda Kurdî bû. Gelek caran min li çîrokên dapîran guhdar dikir, ji wan çîrok û gotinan min bi destê xwe tiştên çandî çêdikirin û wisa ez fêr bûm. Ji bilî vê yekê jî ez fêrî xwedîkirina lawiran, çandinî, dirûtin û hems her tiştekî ku bala mirovan bikşîne, bûm. Fikrê min zelal bû û destê min jî bi tevger û qîmet e, ji bo wê ez li ser çi difikirîm destê min çêdikir. Keda ku min di nava jiyanê de kiriye ku dîrok devê xwe veke wê derheqê min de kêm biaxive."

### 'MİN Jİ JİYANÊ RE NEGOTİYE EZ WESTİYAME'

Hizniya di dewamiya gotinên xwe de bal kişand ser jiyana di hundirê mala xwe de, watedariya wê û wiha domand: "Di mala min de her tişt heye, ji pêdîviyên jiyanî, çandî û her tiştê ku dilê min bixwaze. Hemû jî min bi destê xwe çandine. Min darên behîv, pirteqal, mişmiş û gelek şênkayî di hewşa xwe de çandiye û jê debara mala xwe dikim. Di nav de jî çend lawirên mîna mirîşk, qaz û pez xwedî dikim ji bo hemû pêwîstiyên min di mala de bin û mihtacî derve ne bim. Ji xwe peykerên jinan yên ku di mala min de hene, ez pir watedariyê didim wan û di nav de jî xwe dibînim. Hîn min ji jiyanê re negotiye ez westiyame, tevgera min watedariyê dide jiyana min."

### 'MALA MİN DÎROK E Û DÎROKA MİN JÎ PARASTİNA ÇANDA JİNA KURD E'

Hizniya qala hezkirina xwe ji çand û folklora Kurdî re kir û wiha pê de çû: "Di sala 2006'an de çîroka min bi hevdana tiştên folklorî re dest pê kir. Destpêkê hin tişt li gel min hebûn, lê ne bi qasî ku ez pêşengehekê di mala xwe de vekim. Ev xewna min ya zaroktî bû ku ez her di nava dîroka jina kurd xwe hîs bikim û pêk hat. Ji gelek deveran min tiştên kevnar dane hev û gelek jê jî min bi destê xwe çêkirine, ji çermê lawiran û gîhayên ku ji deştan didim hev. Min çandek afirand. Di mala min de her beşek çand û her tiştek dîrokekê vedibêjê. Caran gelekî kes ji min re digotin ma ev çi tişt in tu li xwe dide hev, lê her min digot ger mirovek dîrokê biparêzê wê çand zindî bimîne, bila ew mirov ez bim. Ez niha di nava dîrokekê de dijîm û pir kêfxweş im ku îro her kes Keça Kurd bi hezkirina çanda resen nas dike. Mala min dîrok e û dîroka min jî parastina çanda jina kurd e."

### 'MİN Bİ DESTÊN XWE ÇAND AFİRANDİYE'

Hizniya bal kişand ser tiştên çandî yên ku di pêşengeha wê de hene, wateya her tiştekî û wiha dirêjî da gotina xwe: "Di pêşengeha min a folklorî de, cil û bergê bûkan hene. Jixwe min bûk bi xwe jî çêkiriye, lê min devê wê çênekiriye, ji ber di hin eşîrên berê de dema ku jin dizewicandin bê şêwir bû. Wateya wê jî ev e ku min devê jinê têde çênekirye. Min destnîşanî êşa jinê kiriya. Dergûşên zarokan jî hene, yên ku dayikên me me tê de hejandin û lorandin heya ku îro em li ser piyan e. Wateya wê jî ku ez qîmetê didim dayika xwe. Li aliyekî din jî hemû alavên cotkariya kevnar û metbexa kurdî hene ji dasik, kevçok, derase, sofra, çaydan, kevirê çêkirina xwarinê, qînax û melhêb. Li aliyê din jî tiştên hunerî mîna teşî, hirî, meşik, sêl, dankut, bêjink , dane avê , hebeşiyê tifikê û gelek tiştên di jî hene li ser lîstokên berê mîna maş û şeşbirik hemû min bi destê xwe çêkirine.
Min gelek peyker çêkirina yên mirovên ku êş û zilm di jiyanê li ber destê axayan didîtin, çêkirin. Li ser malên kurdî yên berê çîrokên hezkirinê yên mem û zîn hemû min kirin peyker. Min bi destê xwe çand afirandiye."

### 'EZ Bİ RASTİYA ÇANDA XWE DİJÎM'

Hizniya di dawiya gotina xwe de bang li jinên civakê kir ku çanda xwe biparêzin û wiha dawî li gotinên xwe anî: "Çanda me dîrok û rastiye me ye, ez bi rastiya çanda xwe dijîm. Ez bi hêvî me her jinek ji çanda xwe hez bike, da ku her dîrok bi navê jinê rûpelên xwe binivîse û li ser dirêj bike."

## Çarşema Sor roja vejînê ye

Çarşem rojeke fadil e, Melik Fexredîn ji eşiq û dil afrandibû,
Nas nedikir rihetî û xefiletê
Çarşem rojeke bê hesab e Ji ba wan meleka hatî ev cewabe
Deriyên xêrê vedikirin ji rojhilat heta rojava
Ev ayînên ola Êzîdî girêdayî Çarşema Sor in. Bi duakirinê û spaskirina Tawosê Melek temam dibin.
Tevî ku her ol ayîn û baweriyên wê cuda ne lê navaroka hemûyan yek e û banga îbadeta xwedê û yekbûna wî dikin û ew afrînerê vê erdê ye.
Ola Êzîdî jî bawer dike ku xwedê jiyan roja Çarşemê vejandiye. Li cem Êzîdiyan ew roja afirandinê ye.
Ji ber ku Êzîdî di dirêjahiya dîrokê de ji ber êrişên domdar li dijî wan, piraniya çanda xwe ya olî wenda kirine. Lê agahiyên xwe ji beytên olî wergirin. Di beyta aferîna dinyayê de tê gotin:



Xwedawendê me înê kir esas e
Şemî boyê berê kiras e



## Dîroka Nexweşiyên Vegir (Pandemic) 2

Sîpan ŞÎNDA

Dema mirov li dîroka van nexweşiyên vegir dinêre, mirov dibîne ka çi telefetên mezin di serê mirovahiyê de anîne. Mirov jinûve çavtirsandî dibe jiber van nexweşiyan. Di gelek demên cuda de mirovahiyê xwe li hemberî van nexweşiyan bêçare dîtiye û bi qedera xwe re tenê mane. Ka îcar qedera wan çi anîbe serê wan! Di navbera salên 1630-1936'ê de Nexweşiya Kulîlkê li gelek deverên cîhanê derketiye û gelek mirov ji ber vê nexweşiyê mirine. Di 1636'ê de Nexweşiya Webayê li Ingilîstanê derketiye. Di 1641-1644'ê de li Çînê Weba derdikeve û dibe sedemê hilweşandina Xanedana Ming. Di 1647-1652'ê de li Spanya Weba Sewîlla derketiye û bi deh hezaran kes kuştine. Di 1655-1656'ê de Weba Londonê derketiye û sed hezar ango %15 şêniPartiyên Kurd ên Rojavayên Londonê qirkiriye. Li Vîyana yê di 1679'ê de webayê 76 hezar kes li vî bajarî kuştine. Di 1738'ê li Balkanan jiber weba yê 50 hezar kes mirine. Di 1770-1972'ê de li Rûsya 50 hezar kes jiber webayê mirine. Di 1793'ê de li Emrîka li bajarê Phildalphia di nava 3 heyîvan 5 hezar kes jiber nexeşiya Zereg ê mirine. Di salên 1817-1824'ê de li Asya û Ewropa jiber Nexweşiya Kolêra yê 100 hezar kes mirine. Dîsa jiber Kolêra ya di 1829'e de destpê kirî de di nava çend salan de li Ewropa, Asya û Emerîka Bakûr 100 hezar kes dimirin. Di 1847'ê de li Kanada yê nexweşiya Tîfûsê derdikeve û ji 20 hezaran zêdetir mirov pê dimirin. Di salên 1852-1860'ê de li Rûsya dîsa Nexweşiya Kolêra derdikeve û felaketekî mezin di serê Rûsya de tîne. Di vê pêla Kolerayê de ji milyonekê zêdetir mirov dimirin. Di 1875'ê de li Fîjî jiber nexweşiya Sorikê 40 hezar kes dimirin. Di salên 1889-1890'ê de jiber nexweşiya Grîpê milyonek mirov di dinyayê de dimirin. Di nava salên 1899-1923'ê de zêdetir ji 800 hezar kesî jiber Nexweşiya Kolêra li Asya, Ewropa û Afrîka dimirin. Di nava salên 1918-1920'ê de li dinyayê de jiber Grîpa Spanya 75 milyon mirov dimirin. Di salên 1957-1958'ê de li dinyayê de jiber Grîba Asyayê 2 milyon kes dimirin. Di salên 1968-1969'ê de jiber nexweşiya Grîba Hong Kongê di dinê de milyonek insan dimirin. Ji 1960'ê hetanî roja me jiber nexweşiya AIDS/HIV'ê 30 milyon kes mirine. Di salên 2008-2009'ê de ji ber nexweşiya Kolêra yê li Zîmbabê ji 4 hezaran zêdetir mirov mirine. Di 2014'ê de li Hîspanyola ji 8500 kesî zêdetir jiber Kolêra yê mirine. Di nava salên 2013-2016'ê de li Rojavayê Efrîka yê jiber nexweşiya Ebola yê 11.300 kes mirine. Hetanî îro jiber Covîd 19, 150 hezar kes mirine û ji 2 milyonan zêdetir kes bi vê nexweşiya giran ketine.

# Li Hesekê navendeke tenduristiyê hat vekirin

Gerînendetiya Tenduristiyê bi hevkariya Heyva Sor a Kurd navendeke tenduristiyê li taxa Til Hecer a bajarê Hesekê vekir. Navend dê bê pere bikeve xizmeta şêniyan.



Ji ber rewşa qedexeya derketina derve û girtina piraniya navendên tenduristiyê yên taybet li bajarê Hesekê û ji bo parastina tenduristiya giştî, Gerînendetiya Tenduristiyê bi hevkariya Heyva Sor a Kurd îro ji bo pêşwazkirina rewşên awarte, navendeke tenduristiyê vekir.
Di navendê de beşên nexweşiyên hundirîn, zarok, jinan, radyolojî û dermanxaneyek ku derman bê pere dide, hene. Dê kadroyên tenduristiyê yên Nexweşxaneya Roj a bajarê Serêkaniyê li navendê bixebitin.
Rêveberê navenda tenduristiyê bijîşk Îbrahîm Ferhan diyar kir ku li gel metirsiyên belavbûna Koronavîrusê armanc ji vekirina navenda tenduristiyê, pêşkêşkirina xizmetên tenduristiyê ji şêniyan re ye û wiha got: "Dê 24 saetan di xizmeta şêniyan de be."

## Şaredariya Qamişlo çemê ceqceq´ê paqij dike

*Darîn SILÊ/Ronahî Qamişlo*

Ji ber gemar û qirêjiya li derdora Çemê Ceqceqê, ji 7`ê Nîsana 2020an ve Şaredariya Gel ya Bajarê Qamişlo dest bi paqijirina Çem kiriye.
Çemê Ceqceqê ku çavkaniya wê li bakurê Kurdistanê ye û di nava bajarê Qamişlo re derbas dibe, bi sedan mal û dikan li derdora wê hene.
Ji ber ku ava karêzan û gemara bajarê Nisêbînê û bajarê Qamişlo dikevin serê, bûye çavkaniya gelek nexweşiyan. Bi taybetî di vê dema dawî de piştî belavbûna vîrûsa korona, gemara Çem li ser jiyana welatiyên li derdorê metirsiyeke mezin çedike.

**BI DU QONAXAN WÊ ÇEM WERE PAQIJKIRIN**

Derbarê mijarê de Hevseroka Ofîsa Bikaranînê ya Şaredariyan ya Bajarê Qamişlo, Mizgîn Hesen, ev agahî dan rojnameya me: "Ji 7`ê meha Nîsanê ve me dest bi pêngava xwe ya baqijkirina Çemê Ceqceqê kiriye. Di plana me de paqijkirina her heft pirên bajêr heye. Xebat ji pira hîzamê dest pê dike. Piştî wê ya mehetê, ya nû, ya şaredariyê, ya Taxa Bişêriyê, Taxa Tey û pira Sîvan hene. Paqijkirina çem ji du qonaxan pêk tê; ya despêkê wê ava çem ji gemar û qirêjiya di navê de were paqijkirin, pişt re emê derdora çem tevê dezenfekte bikin."

**ÇEMÊ CEQCEQÊ BÛYE SEDEMA GELEK NEXWEŞIYAN**

Mizgîn Hesen agahiyeke wiha jî da: "Berî mehekê me amadekarî kiribû ku em dest bi paqijkirina çem bikin. Çimkî nêzî



şeş salan e çem nehatiye paqijkirin, gemar tê de kom bûye. Berî niha ava çem pir paqij û zelal bû, şêniyên bajêr tê de avjeniyê dikirin."
Mizgîn axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi hêvî me ku gelê me yê li derdora çem bi me re alîkar be, çimkî ev gemar li ser jiyana wan



metirsiyê çêdikê, bi taybetî di van rojên belavbûna nexweşiya korona de."

## Xwediyên patozan dest bi amadekariya mewsima çinînê kirin



Xwediyên patozan ên bajarê Hesekê dest bi sererastkirina patozan kirin. Herwisa bang li aliylên têkildar kirin ku tevgera wan hêsan bikin û bihayê parçeyên guhertinan kêm bikin.
Bi nêzîkbûna mewsima çinînê re, cotkar û xwediyên patozan ên bajarê Hesekê dest bi sererastkirina patozan kirin.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, cotkar û xwediyên patozan ji biryara qedexeya derketina derve ya li dijî Koronavîrusê derxistine.
Xwediyên patozan ji bo pêşwazîkirina mewsima çinînê dest bi sererastkirina patozan kirine.
Derbarê zehmetiya sererastkirinê de ya li gel qedexeya derketina derve û peydakirina parçeyên pêwîst, xwediyên patozan ji ANHA'yê re axivîn û diyar kirin ku ji ber bihabûna parçeyên guhertinê û peydanebûna wan li gel qedexeya derketina derve zehmetiyê dikşînin.
Ubeyd Mecwel Dawûd wiha got: "Dema em diçin parçeyan bikirin xwediyên dikanan kesybaziyê dikin û bi bihayê bilind difroşin me. Lewre bi dolar û euro dihesibînin."
Ubeyd bang li aliyên têkildar kir ku tevayiya dikanên sînaî vekin û got, ji ber vekirina dikanekê tenê aloziyê çêdibe û dihêle ku xwediyên dikanan bi bihayê parçeyan bilîzin.
Serokê Odeya Pîşesazî ya kantona Hesekê Ebdulrehîm Osman jî bang li xwediyên patozan kir ku, navên kesên bihayê parçeyên patozan bilind dikin, bidin odeyê.

## Ji bo xelkê gundên Dirbêsiyê navendeke tenduristiyê hat avakirin

Piştî qedexeya derketina derve li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, navendeke tenduristiyê li bajarokê Xas ê girêdayî navçeya Dirbêsiyê hat vekirin. Navend bê pere nexweşên gundên girêdayî navçeyê derman dike.
Ji ber belavbûna Koronavîrusê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê tedbîrên pêwîst ji bo rêgirtina li pêşiya derketina vîrûsê li herêmê girtin. Yek ji wan tedbîran qedexeya derketina derve li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.
Navenda Tenduristiyê ya li bajarokê Xas a ku hate vekirin, dê şêniyên gundên girêdayî navçeyê derman dike. Her wiha nexweşxaneya El-Elî ya taybet a li navçeyê tenê nexweşên navçeyê pêşwazî dike da ku şênî kom nebin.
Navend ji saet 09:00`an sibehê heya 13:00`an vekiriye. Derman û xebatên tenduristî bê pere ji şêniyan re têne pêşkêşkirin.
Girêdayî mijarê endamê rêveber ê Navenda El-Xas doktor Samir El-Nasir got: "Nexweşxaneya El-Elî ya li navçeya Dirbêsiyê ji bo pêşwazîkirina nexweşên navenda navçeyê hate diyarkirin. Me navendek li bajarokê Xas vekir bi armanca ku xebatên tenduristiyê ji şêniyên gundên girêdayî navçeyê re pêşkêş bikin."



El-Nasir destnîşan kir ku ew bê pere nexweşan pêşwazî dikin û diyar kir ku amade ne alîkariya şêniyan bikin.

## Li Şedadê miqdara ardê ji bo firinan hat zêdekirin



Li ser giliyên şêniyên navçeya Şedadê û gundên girêdayî wê ku miqdara nan kêm e, Komîteya Aborî û Rêveberiya Firinan miqdara ardê ku ji firinan re pêşkêş dikin, zêde kir.
Digel ku firin li navçeya Şedadê ya girêdayî kantona Hesekê hene, lê giliyên şêniyên navçeya Şedadê di vê dawiyê de ji ber kêmbûna nan zêde bûbûn. Welatî neçar diman ku bi saetan li dorê bisekinin heta ku tûrekî nan bi dest bixin.
Firina kooperatîf a ku Rêveberiya navçeyê vekiriye, nan li zêdetirî 50 komînan û 15 gundên li xeta rojavayê gundewarên Şedadê ku niştecihên wê zêde ne, belav dike.
Di nav gundên navçeyê de ji gundê El-Ewed ê Şedadê heya gundê El-Reşîdiye derdora 50 hezar niştecih hene.
Li ser giliyên şêniyan ên domdar Komîteya Aborî û Rêveberiya Firinan a Şedadê miqdara ardê ku ji firinan re pêşkêş dikin, zêde kir û kir 12 ton. Beriya niha tenê 4 ton bûn.

## Tevî biryarên Rêveberiya Xweser jiyana karkeran nayê parastin

Tevî ku Rêveberiya Xweser biryar da ku pêwîst e karkerên ku rojane kar dikin ji xetera vegirtina Koronavîrusê bên parastin, lê ew dibin qurbana paşguhkirina berpirsên werşeyên kar û xwediyên zeviyan.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 13`ê Nîsanê komek biryarên girêdayî warê çandinî, cotkaran û karkerên ku di vî warî de kar dikin dan. Ji ber ku piraniya şêniyên herêmê debara xwe bi çandiniyê peyda dikin.
Rêveberiyê bi biryarên ku dane, tevgerên cotkar û karkeran di nav zeviyan de bi nêzîkbûna mewsima çinînê re hêsan kir. Lê bi şertê ku tevahiya tedbîrên xweparastinê ji koronavîrusê werin girtin. Her wiha divê berpirsên werşeyên kar û xwediyên zeviyan rêgezên silametiyê û dûrxistina karkeran ji hev di dema veguhestinê de û dema di nav zeviyan de kar dikin, pêk bînin.
Digel derketina van biryaran rewşa karkeran nehatiye guhertin. Berpirsên werşeyên kar û xwediyên zeviyan karkeran bi hejmarên mezin di erebeyên biçûk de vediguhêzînin. Bi vê yekê biryar û perspektîvên Rêveberiya Xweser ên di vî warî de bin pê dikin.



# Kongreya Star: Topbarana li Mexmûrê berdewama hewldanên dewleta Tirk e

Kongreya Star a kantona Şehbayê topbarana artêşa Tirk a dagîrker a li ser wargeha Mexmûrê şermezar kir û ragihand ku êrîş berdewama hewldanên dewleta Tirk a qirkirina gelê Kurd e, lê hê jî rêxistinên mirovî û Konseya Ewlehiyê bêdeng in.

Roja Çarşemê balafirên artêşa Tirk a dagîrker Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) a li Başûrê Kurdistanê topbaran kirin û di encamê de 3 jin şehîd bûn.
Di vê derbarê de Kongreya Star bi beşdariya hin ji endamên xwe daxuyanî da. Daxuyanî li pêşiya Kampa Berxwedan a kantona Şehbayê bi zimanê kurdî ji aliyê Hêvî Silêman û bi zimanê erebî jî ji aliyê Naîle Mehmûd ve hate xwendin.
Daxuyaniya Kongreya Star wiha ye:
"Em wek Kongreya Star êrişên artêşa Tirk û hovîtiya dewleta Tirk li dijî kampa Mexmûrê ya Başûrê Kurdistanê şermezar dikin, li kampê bi hezaran sivîl hene û duh ji ber êrişên artêşa Tirk 3 jinan jiyana xwe ji dest da û gelek sivîl jî birîndar bûn. Gelê Mexmûrê ji beriya 25 salan ve ji ber êrişên hovane koçber bûn û li kampê bi cih bûn, niha jî ev 9 meh e hikumeta herêmê ku di bin siya AKP`ê de tev digere, kamp dorpêç kiriye, lewma derfetên madî û tenduristiyê kêm in, rewşa debarê zor e. Lê tevî vê yekê vîna gel naşikê û xwedan îradeyeke xurt e, hewl didin xwe ji Koronavîrusê biparêzin û li gorî perspektîfên WHO`yê tev digerin."
Herwiha di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku topbarana artêşa Tirk qirkirina gelên Kurd dike armanc û topbaran rastî salvegera komkujiya Enfalê pêk hat, herwiha di demekê de ku kar û xebat ji bo yekitiya gelê Kurd xwe dide der, pêk hatiye û wiha hate gotin: "Dewleta Tirk bi hevkariya hikumeta herêmê van kiryaran pêk tîne, ji ber perspektîfên xwe ji dewleta Tirk werdigire û bi vê yekê Tirkiye xewnên Osmaniyan pêk tîne."

## Jinên di êrîşê de jiyana xwe ji dest dayîn hatin veşartin



Di encama êrîşa li hemberî Mexmûrê de 3 jinaan jiyana xwe ji dest da û ji bo 3 jinan merasîmek hat lidarxistin. Di merasîmê de Endama Koordînasyona Meclîsa Îştar Nuran Sezgîn axivî û got: "Tevahî mirovahî li hemberê vîrûsê di nava têkoşînê de ye, lê dewleta Tirk û hevkarên wê jî hewl didin ku Kurdan îmha bikin."
Balafirên Keşfê yên bi çek (SÎHA) ên Tirkiyeyê roja Çarşemê saet nêzî 13:10''an de Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) bombe kir. Di êrîşê de şivanên ku li teniştа Mexmûrê pezên xwe diçêrînin kirin hedef. Di êrîşê de 2 jin dema ji bêriyê dihatin li cihê bûyerê û jinek din jî giran birîndar gihandin nexweşxaneyê lê tevî hemû mudaxeleyan jî jiyana xwe ji dest dan. Her wiha 2 roj in tevgera zêde ya keşfê li ser esmanên Mexmûrê hebûn.
Navên jinên ku jiyana xwe ji dest dan hatin aşkerakirin. Di êrîşê de Eyşê Ehmed Ferhan, Ezîme Akdogan û Hewa Akdogan jiyana xwe ji dest dan. Şêniyên wargehê bi merasîmek 3 cenazeyên xwe definkirin. Di merasimê de Endama Koordînasyona Meclîsa Îştar Nuran Sezgîn axivî.
Nuran, di merasîmê de diyar kir ku kir ku tevahî mirovahî li hemberê şewba koronayê di nava têkoşînê de ye, lê dewleta Tirk û hevkarên wê jî di nava hewildana îmha û tunekirina gelê Kurd de ne. Nuran, wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tevahî lêhûrbûyîn û armancê wan li ser tunekirina Gelê Kurd e pêwîste her kes vê yekê baş bizane. Îro sê jinên wê wargehê ji bo debara xwe bi rêvebibin di derdorê wargehê de lawîrên xwe biçêrînin bûn hedefên balafirên arteşa tirk û şehîd ketin."

**'ARMANC TUNEKİRİNA TEVAHİYA KURDAN E'**

Nûran, da zanîn ku ev êrîş tenê ne planên dewlate tirk e û wiha got: "Ger ku îro hikûmeta herêmî, hikûmeta navendî û netewên yekbûyî li hemberê vê yekê bêdeng bin û temaşevanbin wê ev êrîşane bidomin û wê tevahî wargehê tune bikin. Em ev nêzîkatî û bêdengiya wan şermezar dikin. Em baş dizanin ku armanc tunekirina tevahî Kurdan e, ev êriş ji bo her çar perçe têkirin."
Nuran, di dawiyê de wiha got: "Pêwîstiya me heye em yekitiya xwe leztir avabikin. Li ser vê bingehê em her sê jinên ciwan ên şehîd ketine bibîrtînin û ji malbatê wan re jî sersaxiyê dixwazin."
Merasîma her sê jinan bi dirûşmeya "Şehîd namirin" dawî bû.

## Kongreya Star a Efrînê êrîşa ser Wargeha Mexmûrê şermezar kir



Rêxistina Kongreya Star a Herêma Efrînê êrîşa dewleta Tirk ya ser wargeha Mexmûrê bi daxuyaniyekê li wargeha Berxwedan a Şehabyê şermezar kir.
Roja Çarşemê dewleta tirk carek din êrîşî wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) kir û di encamê de 3 jinan jiyana xwe ji dest da û birîndar çêbûn. Rêxistina Kogreya Star a herêma Efrînê êrîşa dewleta Tirk û kiryarên wê bi daxuyaniyekê li kampa Berxwedan a Şehbayê şermezar kir. Di daxuyaniyê de Rêveberiya Xweser û sazî û endamên Rêxistina Kongreya Star amade bûn. Herwiha di daxuyaniyê de wêneyê Rêber Abdullah Ocalan û alên Kongreya Star hatibûn hildan. Daxuyanî ji aliyê Endama Koordînasyona Kongreya Star a Efrînê Hêvî Silêman ve hat xwendin.

Daxuyanî wiha ye:
"Em li ser navê Kongreya Star a herêma Efrînê êrîş û topabaranên dewleta tirk a faşist ên li ser Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) şermezar dikin. Di wargehê de bi hezaran şêniyên sivîl lê dijîn û di encamê van êrîşan de 3 jinan jiyana xwe ji dest dan û hin jî birîndar bûn. Zêdetirî 25 sal gel bi dara zorê ji cih û warên xwe koçber bûn û li wargeha Mexmûrê bi cih bûne. Her wiha zêdetirî 9 mehan jî ji aliyê hikumeta KDP'ê ve hatî dorpêçkirin. Ruxmî kêm derfetan û pêdîviyên jiyanî jî dîsa karîbûn xwe ji Vîrûsa Korana biparêzin, lê dewleta tirk biryarên Desteya Tendirustî ya Cîhanî û biryara şer sekinandin ya (NY) bin pê dike û êrîşên xwe li wargeha Mexmûr, Kantona Şehbayê û Rojhilatê Firatê didomîne, ev yek jî ji siyaseta dagirkeriya ya hegomanîk tê ji ber ku encama wê ya yekem qirkirina hebûna Gelê Kurd e.
Di dema hewildanên kurdan ên ji bo pêkanîna Yekîtiya Netewî û di eynî bîranîna komkujiya Enfel de, dewleta tirk êrîş dike. Em bi tundî van êrîşan şermezar dikin û banga me ji saziyên Mafê Mirovan, Netewa Yekbûyîn û Rêxistinên Tendirustî ya Cîhanî heye ku bêdengiya xwe bi dawî bikin, û zextekê li ser dewleta tirk bikin bi taybet di vê rewşa Cîhan û mirovahî tê re derbas dibe û rê li pêşiya kiryarên dijmirovî bigirin."
Daxuyanî bi dirûşmên "Jin jiyan azadî" û "Bimre faşîzîm" bi dawî bû.

## Ji Kongreya Star daxuyaniya cejna Çarşema Sor

Koordînasyona Kongreya Star bi daxuyaniyekê cejna Çarşema Sor li civaka Êzîdî û tevayiya gelên herêmê pîroz kir.
Koordînasyona Kongreya Star bi pêmana cejna Çarşema Sor daxuyaniyek nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Di serî de em sersala Êzîdiyan Çarşema Sor l gelên herêmê, bi taybetî civaka me ya Êzîdî pîroz dikin. Ev cejn ji bo civaka Êzîdî di nav xwe de wateyên pîroz, olî û niştimanî digire. Di vê rojê de jiyan nû dibe, xweza bi rengê nû, rengê jiyana nû xwe dixemilîne. Ev cejin ji bo me giyanê aştî û jiyana hevbeş di navbera gelên herêma Mezopotamyayê nîşan dide.
Cejna sersala Êzîdiyan Çarşema Sor a îsal li gel tedbîrên li dijî pandemiya global a Koronayê ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê biryara qedexeya derketina derve daye, tê pêşwazîkirin. Ji ber wê ji bo parastina gelê me, tê xwestin ku tedbîrên Rêveberiya Xweser girtine di ber çavan re derbas bikin.
Em Koordînasyona Kongreya Star vê munasebeta resen li civaka me ya Êzîdî û gelên herêmê pîroz dikin."

# Eyşe Hiso: Hikumeta Iraqê û Başûrê Kurdistanê berpirsên êrîşa Tirkiyê ne

Hevseroka PYD'ê Eyşe Hiso li ser êrîşa dewleta Tirk a dagîrker ya ser wargeha Mexmûr (Şehîd Rustem Cûdî) wiha got: "Helwesta hikumeta Iraqê ya li dijî êrîşa Tirkiyê ya ser wargehê têrê nake. Hikumeta Iraqê û Başûr Kurdistanê berpirsên êrîşa Tirkiyê ne."



Wargeha Mexmûr (Şehîd Rustem Cûdî) ya li başûrê Kurdistanê gelek caran dibe hedefa artêşa Tirk a dagîrker. Herî dawî balafirên dewleta Tirk 15`ê Nîsanê wargeh kirin hedef. Di encamê de sê jinan jiyana xwe ji dest da.
Hevseroka PYD'ê Eyşe Huso diyar kir ku di van şertan de, li gel xetera li dijî mirovahiyê ji ber belavbûna Koronavîrusê, dewleta Tirk hovîtiya xwe ya li dijî kurdan eşkere dike.
Eyşe wiha dirêjî da axaftina xwe: "Di dema ku cîhan tedbîran li dijî Koronavîrusê digirin, balafirên dewleta Tirk êrişî wargehê dikin. Ev ji bo tevahiya dewletên cîhanê rûreşî ye. Di dema ku Koronavîrus li cîhanê belav dibe, dewleta Tirk faşîzma xwe eşkere dike û êrişî herêm û bajarên Kurdan dike."
Eyşe bal kişand ser bangawaziyên NY û hêzên navneteweyî yên ji bo ragihandina agirbestek cîhanî û wiha dewam kir: "Digel vê jî dewleta Tirk li aliyekî êrişên xwe yên hovane li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî didomîne, li aliyê din jî di 15`ê Nîsanê de bi balafirên xwe êrişî wargeha Mexmurê kir. Ji xwe ev bi mehane mexmûe di nav ambargoyek tengav û xeteriyê de ye."

## Hediya Yûsif: Tirkiyê Koronavîrûsê weke çekekî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi kar tîne

Hediya Yûsif bang li civaka navneteweyî kir ku fişarê li dewleta Tirk bike da ku êrîşên xwe yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestîne. Hediya Yûsif diyar kir ku bêjêrka wan a li hemberê êrîşên Tirkiyê berxwedan e.
Di demekê de ku cîhan bi têkoşîna li dijî Koronavîrusê ve mijûl e û banga agirbestê li aliyên Sûriyê hatiye kirin, artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê êrîşên xwe yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomînin.
Derbarê berdewama êrîşên artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên girêdayî wê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û guhnedana bangewaziya agirbestê endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif ji ANHA'yê re axivî.
Hediya Yûsif di destpêka axaftina xwe de tedbîrên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo pêşîgirtina li koronavîrusê girtîn bîr xistin û got, "Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina herêmê ji Koronavîrusê bi derfetên kêm ên tenduristiyê tedbîrên pêwîst girtime."

**'TIRKIYE QANÛNÊN NAVDEWLETÎ BINPÊ DIKE'**

Hediya Yûsif diyar kir ku dewleta Tirk biryarên navdewletî binpê dike û wiha dom da axaftina xwe: "Dewleta Tirk bi êrîşên xwe qanûn û bangewaziyên navdewletî yên rawestandina şer di van mercan de binpê dike, mîna ku berê di gelek munasebatan de binpê kiribûn û bi awayekî rasterast li Lîbya û Bakur û Rojhilatê Sûriyê şer bi rêve dibe."
Hediya Yûsif da xuyakirin ku çekên ku di êrîşa ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi kar tên bi çeteyan re nînin, lê belê bi artêşa Tirk a dagirker re hene.

**'ARTÊŞA DAGÎRKER YEKSER HERÊMÊN TIJE SIVÎI DIKE HEDEF'**

Hediya Yûsif di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser êrîşên li ser kantona Şehbayê û got, "Artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê rojane kantona Şehbayê topbaran dike. Di êrîşên dawî de çekên giran hatin bikaranîn ku li cem çeteyan nînin. Artêşa Tirk rasterast herêmên kantona Şehbayê yên tijî sivîl topbaran dike, di encamê de sivîl şehîd û birîndar dibin."
Hediya Yûsif, diyar kir ku li hemberî van êrîşan erka Yekîtiya Ewropa, Neteweyên Yekbûyî û aliyên têkildar ew e ku helwestekê nîşan bidin ku êrîşên domdar ên Tirkiyê rawestin.

**'TIRKIYÊ HEWL DIDE KORINA DERBASÎ BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYÊ BIKE'**


Endama Koordînasyona Kongreya Star da zanîn ku dewleta Tirk hewl dide Koronavîrusê derbasî herêmên Bakur û Rojhilatê



Sûriyê bike û axaftina xwe wiha domand: "Agahî di destê me de hene dibêjin ku dewleta Tirk kesên gumanên vîrusê li ser wan hene derbasî kantona Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê dike."
Hediya Yûsif da zanîn ku dewleta Tirk qanûnên mafên mirovan derbas dike, helwesteke cidî li hemberî Koronavîrusê nîşan nade, dixwaze vê nexweşiyê ji bo armancên xwe yên li djiî welatiyên Bakurê Kurdistanê û girtiyên siyasî bi kar bîne, serokkomarê Tirkiyê Erdogan li ser welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelemperiya Kurdistanê xeter e."
Hediya Yûsif, bêdengiya civaka navneteweyî ya li hemberî êrîşên Tirkiyê rexne kir û got, bi berdewama bêdengiyê êrîş wê bidome.
Endama Koordînasyona Kongreya Star Hediya Yûsif di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku bijêrka tekane ya li hemberî êrîşên Tirkiyê berxwedan e û got, "Helwesta me berxwedan e, li hemberî van êrîşan emê mafê parastinê bi kar bînin.

## KNK'ê banga diyalogê li YNK û PDK'ê kir

KNK'ê bi daxuyaniyekê bang li PDK û YNK'ê kir ku hêzên xwe yên ne pêwîst ji Zînê Wertê vekişînin û pirsgirêkê bi riya diyalogê çareser bikin.
Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) têkildarî aloziya li Zînê Wertê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Daxuyaniya KNK'ê wiha ye:
"Tevahiya cîhanê, niha li hemberî vîrusa koronayê bê çare maye. Cîhan di nava rewşeke aborî, rêveberî û saxlemîyê de derbaz dibe. Hemû xelkê cîhanê li bendê ne ku çareseriyek ji bo vê derd û nesaxiyê bê dîtin û mirovahiyê ji vê karesata kujer rizgar bike. Bêguman Kurdistan û xelkê wê jî ji vê rewşê ne dûr in. Tevî pirsgirêk û arîşeyên aborî, siyasî û rêveberiyên xwe ev derd û nesaxiye jî hatiye ser. Lê mixabin di vî demê nazik de PDK û YNK, ku du hêzên ser destên Başûrê Kurdistanê ne û perpirsiyariya rêveberî û parastina xelkê Kurdistanê li ser milên wan e, li Zînê Wertê hêzên xwe yên çekdar li hember hev du kom dikin. Vê helwestê strês û matmayînek bi tirs li gel gelê me çêkiriye.
Birînên şerê navxwe hêj nehatine pêçan. Komkirina hêzan li hemberî hev û şerê medyayî xelkê Kurdistanê kiriye nava rewşek ne aram û herwiha





şerê qirêjê navxwe li bîr tîne.
KNK daxwaziyeke lezgîn li YNK û PDK'ê dike, hêzên xwe yên ne pêwîst ji wan deveran û yên li hember hev rawestiyan paşve vegerînin. Pirsgrêk û arîşeyan bi rêya diyalog û aştiyane û berpirsyarane çareser biken.
Em bi hemû hêza xwe ve amadeyî her alîkariyekê ne. Ji hemû kenalên peywendiyên me re em ê hewla aramkirina vê rewşê û dîtina rêyên çareserîyê ji bo asyayîkirina vê rewşê bidin.
Em wek Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê bi bawer in ku di nava gelê me yê Başûrê Kurdistanê, di nav rêveberên PDK û YNK'ê de, her wiha di nava endam û alîgirên wan de kesayetiyên dilsoz û xemxwerên xelkê zêde hene ku bikarin bi hekîmane nêzî rewşê bibin û Kurdistanê ji agirê şer û karesateke navxweyî dûr bixin."

## 'Divê hikûemta Iraq û herêma Kurdistanê li hemberî êrîşên Tirkiyê helwestekê nîşan bidin'

Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê êrîşa artêşa Tirk a dagîrker a li ser wargeha penaberan a Mexmûrê (Rustem Cûdî) şermezar kir û bang li hikûmeta Herêma Kurdistanê û Iraqê kir ku li hemberî êrîşên Tirkiyê helwesteke cidî nîşan bidin.
Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê têkildarî êrîşa hawayî ya artêşa Tirk a dagîrker a li ser wargeha penaberan a Mexmûrê (Rustem Cûdî) ku di encamê de 3 jin şehîd bûbûn, daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Partiya Aştiya Demokat a Kurdistanê diyar kir ku êrîşa dewleta Tirk a hovane ya li ser wargeha "Mexmûrê" berdewa sûcên dewleta Tirk e û hewldana ji bo qirkirina gelê Kurd e.
Herwiha hat diyarkirin ku ev êrîş hemwextî aloziya di navbera her du partiyên kurdî yên sereke yên li Başûrê Kurdistanê de pêk hat û got, ev yek dide diyarkirin ku artêşa Tirk ji naokiyên Kurdî-Kurdî sûdê digire da ku nasnemay Kurdî tine bike.



# Dagîrker hewl didin nexweşên Koronavîrusê derbasî herêmên Rêveberiya Xweser bikin

Çavkaniyên ji hundirê bajarokê Silûkê diyar kir ku dewleta Tirk ji 5 welatiyên ku nexweşên Koronavîrusê ne, xwest ku biçin herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li beramberî wê wê pereyan bidin wan.



Li gorî çavkaniyan ku 5 kes li bajarokê Silûk ê dagîrkirî yê rojhilatê bajarê Girê Spî bi Koronavîrusê (Covid-19) ketine. Dewleta Tirk a dagîrker ji her 5 welatiyan xwest ku derbasî herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojilatê Sûriyê bibin û li beramberî wê dê pereyan bidin wan. Ti agahî derbarê nexweşan de nehetin girtin ka tên dermankirin û ka ti rewşên din ên nexweş li kantona dagirkirî hene.
Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemdan El-Ebid teqez kiribû ku dewleta Tirk nexweşên Koronavîrusê yên li Tirkiyê ber bi bajarê Girê Spî ve dişîne.

## Li Qamişlo pakêtên xwerek hatin belavkirin



Rêveberiya Xweser beşa yekê ya pakêtên xwerek li malbatên hewcedar ên ku debara xwe bi karê rojane dikin, belav kirin.
Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çarçoveya parastina ji Koronavîrusê (Covid-19) biryara qedexeya derketina derve da. Gelek kar hatin rawestandin û bandor li rewşa debarê ya hin malbatan kir. Ji ber wê rêveberiyê biryara belavkirina parên xwerek li malbatên zehmetiya debarê dikişînin, da. Roja Çarşemê Meclisa Qamişlo beşa yekê ya pakêtên xwarek li 300 malbatên li bajêr ên ku debara xwe bi karê rojane dikin, belav kirin.
Endamê Rêveberiya Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) a taxa Xerbî ya Qamişloy Selah Helbo da zanîn ku beşa yekê ya alîkariyê belav kirin û wê çend carên din jî belav bikin.
Rêveberiya Xweser diyar kir ku belavkirina pakêtên xwerek dê heta bidawîkirina dema qedexeyê berdewam be.

**GIRKÊ LEGÊ**

Li navçeya Girkê Legê meclisa navçeyê 100 pakêtên xwerek li 100 malên hewcedar ên li nava navçeyê belav kirin.
Serokatiya meclisa navçeyê piştrast kir ku wê pakêtên xwerek li tevayiya malbatên navçeyê yên hewcedariya wan pê heyî, belav bikin.

**DÊRIK**

Herwiha li Dêrikê jî 200 pakêtên xwerek li malbatên feqîr hatin belavkirin.
Komîteyên Rêveberiya Xweser bi hevkariya komîn û meclisa navçeya Dêrikê 200 pakêtên xwarek li malbatên hewcedar belav kirin.
Wê pakêt li tevayiya malbatên zehmetiya debarê dikişînin, werin belavkirin.


## Li gorî Neteweyên Yekbûyî vegera li rewşa asayî bi derziyê pêkan e



Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonîo Gûterres destnîşan kir, vegera li jiyana asayî ya li cîhanê bi çêkirina derziyek li dijî vîrûsê dibe.
Gûterres got, "Piştî ku li dijî Covîd-19 derziyeke bê bawer û bi bandor hate çêkirin, hingî hesta asayîbûnê wê li cîhanê vegere."
Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonîo Gûterres diyar kir ku ew hêvîdar e heta dawiya salê derziyek bê amadekirin û got, "Derziyeke bi vî rengî wê jiyana bi milyonan mirovî û bi milyaran dolarî rizgar bike."
Gûterres bi rêveberên 50 welatên Efrîkayê yên endamên Neteweyên Yekbûyî re vîdeokonferans kir û xwest, karê ji bo çêkirina derziyê bê zêdekirin û her kes karibe jê sûdê werbigire.
Gûterres anî ziman, bi saya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê, Neteweyên Yekbûyî kariye amûra testa Covîd-19 bide 47 welatên Efrîkayê û kêfxweşiya xwe ya ji ber vê yekê anî ziman.

## Îlham Ehmed WHO rexne kir û bang li hikumeta Sûriyê kir ku bi berpirsyarî tev bigere

Seroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriya Demokratîk Îlham Ehmed civaka navneteweyî rexne kir ji ber ku di vê rewşê de li gel belavbûna Koronavîrusê desteka tenduristî ya pêwîst ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê re pêşkêş nekiriye. Îlham got hikumeta Sûriyê bi Rêveberiya Xweser re li dijî Koronavîrusê hevkariyê nake, eger vîrus li herêmê belav bibe wê berpirsyarî ya hikumeta Sûriyê be.
Digel ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelek dewletên din bi hewcedariya amûrên tenduristiyê yên têkildarî Koronavîrusê (Covid-19) ne, piraniya aliyan di serî de Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) dualîbûnê bi gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re dide û distîne, bi hinceta ku ew bi hikumetan re têkiliyan ava dike. Di heman demê de alîkarî û amûrên tenduristî dişîne herêmên di bin kontrola artêşa Tirk a dagirker de li Sûriyê.
Îlham Ehmed, di dewama axaftina xwe de wiha got: "Mixabin herêmên Rêveberiya Xweser ji tevahiya cureyên desteka mirovî mehrûm in. WHO li herêmê heye. Bi saziyên Rêveberiya Xweser re dide û distîne. Lê desteka ku ji herêmê re tê pêşkêşkirin besît e. Tê zanîn ku mîna van rêxistinan bi awayekî fermî bi hikumetên navendî re peywendiyan ava dikin. Biryarên van hikumetan di ber çavan re derbas dikin. Em dibînin ku ev mekanîzmaya kar ne rast e. Ji ber ku hikumeta Sûriyê heta niha bi awayekî neyînî bi mijara opozîsyonê û demokrasiyê re da û stand. Heta niha jî li ser mijara navendîbûnê bi israr e. Her wiha li ser tevahiya rêbazên ku li dijî opozîsyonê bi kar tîne, bi israr e. Lewra ne rast e ku ev rêxistin tenê bi rêya hikumetên fermî bide û bistîne."
Îlham Ehmed got, em dizanin ku WHO ji Rêveberiya Xweser re amûrên keşfkirina nexweşiya Koronavîrusê diyar kirine, lê heta niha nedane. Hejmarek ji wan amûran ji hikumeta Sûriyê re pêşkêş kirine. Her wiha destek ji herêmên komên din re jî pêşkêş kir. Ev wek biryareke siyasî tê hesibandin. Divê rewşên mirovî yan jî warê mirovî neyê ramyarîkirin. Her wiha cihê rexnê ye. Divê NY û WHO li biryarên xwe vegerin da ku vê mijarê derbas bikin.
Îlham Ehmed da zanîn ku rojane têkiliyên wan bi Koalîsyona Navneteweyî re hene û got, em her tim ji wan dixwazin destekê pêşkêş bikin. Heta niha tu cureyên alîkariyên tenduristî yên taybet li dijî Koronavîrusê ji hêla wê ve nehatine pêşkêşkirin. Herî kêm divê amûrên keşfkirina nexweşên vê vîrusê pêşkêş bike. Ji ber ku ger nexweşî li herêmê belav bû, wê bibe sedama karesateke mezin. Divê em van xetereyan derbas bikin. Lewra em bang li Koalîsyona Navneteweyî dikin ku bilez derfetên pêwîst ji herêmê re pêşkêş bikin.
Derbarê Rûsya de jî Îlham Ehmed wiha got; Rûsyayê jî heta niha tiştek pêşkêş nekiriye. Tevahiya alîkariyan ger hebin tenê bi rêya WHO'yê ji herêmên Sûriyê re têne pêşkêşkirin. Aliyê Rûsyayê berpisê vê mijarê ye. bi taybet li herêmên ku hêzên wê tê de belav dibin. Tê zanîn ku hêzên leşkerî herî zêde rastî mîna vê pandemiyê tên. Têkiliyên hêzên Rûsyayê bi hêzên rejîmê û Îranê re



hene. Yanî xetereyeke mezin heye ku ew pandemî bi rêya hêzên Rûsyayê û rejîma Sûriyê derbasî herêmê bibe. Lewra divê hikumeta Sûriyê vê mijarê di ber çavan re derbas bike. Tiştên jê tên xwestin pêşkêş bike heta ku herêmê ji xetereya vê pandemiyê xilas bike.